



Gesundheitskiosk

Şîreta tenduristiyê li taxa we

Health guidance in your neighborhood
Gesundheitsberatung in Ihrem Viertel
Медицинская консультация в вашем районе
Doradztwo zdrowotne w Twojej okolicy
Mahallenizde saġlık danışmanlığı

مشاوره سلامت در ناحیه شما
مشورة صحية في منطقتك



Zimanên
dîn





Wateya kioska tenduristiyê çi ye?

Em ji we re dibin alîkar ku hûn ji bo tenduristiya xwe bingehêk çêtirîn çêbikin. Xebatkarên me ji aliyê bijîşkî ve hatine perwerdekirin. Ew ê bersiva pirsên we bidin û we bi pisporên ku dikarin di fikarên weyên taybetî de ji we re bibin alîkar – wek bijîjk, dezgehên lênihêrînê an pargîdaniyên bîmeya tenduristiyê re têkilî daynin. Ew şîret dikin û pêşniyarên şaredariyê ji bo piştgirîya bilez û neburokratîk dikin.

Kî dikare bi me re têkilî dayne?

Deriyê me ji her kesê ku di rewşên jiyanê yê dijwar de hewceyê şîretan an piştgirî hewce dike vekirî ye. Kioska tenduristiyê cihê ku hûn tê fêhm kirin e. Em li cihê ku hûn hewceyê me ne – li taxa we.

**Pir xweş e ku
we riya xwe
ji me re dît...**

Pêşniyarên me

Kioska tenduristiyê şîret dike, navbeynkariyê dike û di lêgerînê de dibe alîkar, ew mirovan bi pêşniyarên alîkariyê yên guncan ve girêdide.



Alîkarî
dema ku li
bijîşkek giştî an
pîspor digerin



**Şêwirmendî û tora bi
pêşkêşkeran re**

di ducaniyê de, dayiktiyê
û bavîtiyê de, di pirsên
perwerdehiyê de, di
pêşgirtin û tedbîrê de,
hewcedariya lênêrînê
û her weha piştgirî ji bo
xizmên lênêrînê

**Pêşlêgirtin û
alîkariya zû m**

ji bo zarok, ciwan, jin û
mêran li ser mijarên wekî
tendurustiya derûnî,
werzîş û xwarinê



Alîkarî

dema têgihîştina
belgeyên wek B.
nameya doktor ji
nexweşxaneyê



Ihre Gesundheit liegt uns am Herzen • We care

about your health • Sağlığınız bizim için çok değerlidir •

Для нас очень важно, чтобы вы были здоровы • Troska o

Twoje zdrowie leży nam na sercu • سلامت شما اولویت نخست ما است •

Tenduristiya we ji bo me girîng e • صحتك لها الأولوية لدينا •




Em ji bo we li vir in!

**Em şîret dîkin û piştgirîya we û
hezkirîyên we dîkin ku hûn saxlem
bibin û sax bimînin.**

Em guh didin we û ji we re dibin alîkar ku
hûn tenduristiya xwe û bi vî rengî jiyana
xwe bigirin destên xwe. Ne girîng e ku hûn di
çî rewşê de ne – werin me bibînin!

**Hûn nexweş in û
hewceyê şîret û
alîkariyê bijîjkî ne,
da ku hûn dîsa li cem
hezkirên xwe bin – lê
hûn nizanin serî li kê
bidin?**



Ma hûn ducanî ne an
ji berê de dêûbav in
û dixwazin zaroka
xwe di jiyane de
destpêkek saxlem
bidin, lê hûn nizanin
li ku piştgirî bibînin?



Ma hûn dixwazin
ji **zarokên** xwe re
derfetên werzîşê
(spore) **pêşkêşî** bikin,
lê hûn pêşkêşvanan
nizanin û drav kêma e?





**Pirsgirêkên te yê
tenduristiyê hene,**
tu nikarî bixebitî,
te çûyî cem gelek
bijîjkan û nêrînên cihê
bihîstine, lê ew baştir
nebûye?



**Endamek malbatê
nexweş e lê ditirse
– an şerm dike – ku
biçe cem doktor, ew
dixwazin alîkariyê bikin
lê nizanin çawa?**





Ma hûn dixwazin li
dêûbav an dapîr û
dapîr û bapîrên xwe
xwedî derkevin lê hûn
nikarin di navbera kar,
zarok û tenduristiya
xwe de rêve bibin?

Hûn dikarin xemên xwe
spartin me – tenduristiya
we navenda xebata me ye.

Werin!





Gesundheitskiosk

Şîreta tenduristiyê li cîrantiya we

We care about your health

Ihre Gesundheit liegt uns am Herzen

Для нас очень важно, чтобы вы были здоровы

Troska o Twoje zdrowie leży nam na sercu

Sağlığınız bizim için çok değerlidir

سلامت شما اولویت نخست ما است

مشورة صحية في منطقتك

Em ji we re dibin alîkar ku hûn ji bo
tenduristiya xwe bingehek çêtirîn çêbikin.
Xebatkarên me ji aliyê bijîşkî ve hatine
perwerdekirin. Kioska tenduristiyê cihê ku
em bi zimanê we diaxivin e. Em li cihê ku hûn
hewceyê me ne – li taxa we.